# 90. Pirjimarî di Kurmancî de

**Zafer AÇAR**[1]

**APA:** Açar, Z. (2023). Pirjimarî di Kurmancî de. *RumeliDE Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*, (Ö13), 1452-1467. DOI: 10.29000/rumelide.1379376.

**Kurte**

Mêjer babeteke girîng ya sehaya morfolojîk û morfosentaktîk e ku di piraniya zimanan de wekî yekjimarî û pirjimarî dibe du kategorî. Di kurmancî de jî pirjimarî dikeve bin navê mêjerê û wekî jimarnav cureyeke peyvan ya din jî heye ku eleqeya wê bi mêjerê re heye. Di diyalekta kurmancî ya kurdî de pirjimarî, di morfolojiya nominal de; pirjimarkirina navdêr, cînav û rengdêran, di mijarên îzafe, tewang, baneşanê de û di morfolojiya verbal de; di kişandina lêkeran de bi rêkeftina biker û berkarê digel pêveberê saz dibe. Di vê xebatê de hin ji wan hev-fonksiyon jî bin yan jî varyantê cuda yên heman morfeman jî bin, hin varyantên devokî anku allomorfên wan ne tê de, serhev sêzde morfemên pirjimarkirinê yên kurmancî hatin tesbîtkirin. Ev mijara ku hema bêje di hemî berhemên rêzimana kurmancî de bi hecmên ciyawaz cih girtiye wekî mijareke xusûsî xebateke akademîk li ser çênebûye. Îja ev xebat digel têgerîneke lîteraturê ya li ser rêzimanên kurmancî, berê xwe dide hin rehendên vê mijarê yên ku nehatiye dîtin yan jî girîngî pê nehatiye dan bi vî şiklî balê dikşîne ser wan. Herwiha gelek morfemên pirjimariyê hene ku reftarên klîtîkî dinimînin, nîşandana vî karakterî yê wan, armanceke din ya vê xebatê ye.

**Peyvên Serekî:** Mêjer, Pirjimarî, Morfemên pirjimarkirinê yên kurmancî

## Kürtçe'nin Kurmanci Lehçesinde Çoğulluk

**Öz**

Bir biçimbilim ve sözdizimi konusu olarak sayı pek çok dilde tekillik ve çoğulluk olarak iki kategoridir. Kürtçe'nin Kurmanci Lehçesinde sayı (*mêjer*) konusuna dahil olan çoğulluk bir kelime türü olan *jimarnav* (sayı-isim) ile de alakalıdır. Kurmanci de çoğulluk, nominal morfolojide; isim, zamir ve sıfatların çoğullarında, izafe, büküm ve seslenmede, verbal morfoloji de ise; fiil çekimlerinde özne-eylem, nesne-eylem uyumunda kendini göstermektedir. Böylelikle Kurmanci lehçesinde kimisi aynı işleve sahip olmalarıyla beraber ya da bir morfemin farklı varyantları olsalar da, ağızlardaki bazı yerel varyantları, başka bir deyişle allomorfları hariç, toplamda on üç çoğul eki tespit edilmiştir. Neredeyse tüm Kurmanci gramer kitaplarında farklı hacimlerle yer alan bu konu üzerine özel bir akademik çalışmaya rastlanılmamıştır. Literatürdeki diğer çalışmalara değinen bu çalışma konu hakkında fark edilmemiş noktalara ya da konunun ihmal edilmiş taraflarına odaklanmaktadır. Ayrıca bazı çoğullaştırma morfemlerinin klitik özelliği gösterdiğini ortaya koymak bu çalışmanın diğer bir amacıdır.

**Anahtar kelimeler:** Kurmanci, Sayı, Çoğulluk, Kurmanci çoğul ekleri

1 Dr. Öğr. Üyesi, Bingöl Üniversitesi, Doğu Dilleri ve Edebiyatları Bölümü, Kürt Dili ve Edebiyatı ABD (Bingöl, Türkiye), zacar@bingol.edu.tr, ORCID ID: 0000-0001-5323-9531. [Araştırma makalesi, Makale kayıt tarihi: 30.08.2023-kabul tarihi: 23.10.2023; DOI: 10.29000/rumelide.1379376]

## Pluralism in the Kurmanji Dialect of Kurdish

### Abstract

Number as a subject of morphology and syntax is two categories in many languages, singular and plural. The plurality included in the issue of number (mêjer) in the Kurmanji dialect of Kurdish is also related to jimarnav (number-name), which is a type of word. Pluralism in Kurmanji is in nominal morphology; plurals of nouns, pronouns and adjectives, inflection, inflection and vocalization, in verbal morphology; It shows itself in subject-verb, object-verb agreement in verb conjugations. Thus, a total of thirteen plural suffixes have been identified in the Kurmanji dialect, excluding some local variants, in other words allomorphs, although some have the same function or are different variants of a morpheme. There is no special academic study on this subject, which is included in different volumes in almost all Kurmanji grammar books. Referring to other studies in the literature, this study focuses on unnoticed points or neglected aspects of the subject. In addition, another aim of this study is to reveal that some pluralization morphemes show clitic features.

**Keywords:** Kurmanji, Number, Pluralism, Kurmanji plural suffixes

### Destpêk

Wekî taybetmendiyeke zimanî mêjer û dualitiya wê karîger e li ser şekilgirtina peyvrêziyê û şekildana wê jî, him di hingama axaftinê him jî di hingama nivîsandinê de. Ji çend dijberiyên nav-zimanî -bo nimûne zayend, mîna: mêza-nêrza, nasyarî: diyar-nediyar- yekjimarbûn û pirjimarbûna êlemanan jî girîngiya xwe heye û di hin zimanan de ev taybetmendî zêdetir kar li ser cureyên peyvan dikin ku pê rêkeftina maneyî û ya gramatîk saz dibe.

Heyber di zimanan de wekî 1)kit (tik/tek), 2)cot, 3)kom dikarin bibin sê grûp ku ev kategorîzekirin işaret bi jimara wan dike. Piraniya zimanan xusûsen di mijara navdêran de bi vî şiklî be jî hin ziman ketegoriyên mêjerî yên din jî dihewînin bo nimûne di navdêr yan jî cînavan de. Di erebî de xêncî yekjimarî û pirjimariyê heyber dikarin duyanî/dujimar (ing. *dual*, er. *tesniye*) bin ku di vî zimanî de kategoriyeke cuda ye. Trask (2007, r. 192) behsa hin kategoriyên din jî dike: "Di zimanekî Pasîfîkî *Larike*yî de cînav wekî *mane* ew, *matua* ew herdu, *matidu* ew hersê, *mati* ew herçar û zêdetir nîşan dide ku formê sêyem *trial* (sêyanî/sêjimar) e". Dîsa Trask li ser zimanê *Tigre*yî kategoriyeke din jî dide ku ji çend heyberan pêk tê ku wî ew kategorî wekî *paucal* (çendekî/çendjimar) bi nav kiriye.

Herwiha Corbet (2004, r. 20-30) peyvan wekî yekjimar, dujimar, sêjimar, çarjimar (bn. di zimanê *susurunga* de, li ser cînavên empatîk), çendjimar (bn. di zimanê *baysoyî*) de û pirjimar li ser hin zimanên dinyayê nimûne dike.

Li vir eger em li ser hin cînavên kurdî nimûne bidin xusûsen di hingama kişandina lêkeran de carna jimar wekî sê kategori dixuyê: a) Rewşa lêkerê ya têneper yekjimar; 1) Ew çû. 2) Ew herdu/hersê/herçar… çûn. 3) Ew çûn. b) Rewşa lêkerê ya têper; 1) Wî/ê kar kir/kirin. 2) Herduyan/hersêyan/herçaran kar kir/kirin. 3) Wan/Hemûyan kar kir/kirin.

Divê li vir ev jî bê gotin ku hin lêkolînerên wekî Mela Mehmûdê Bazidî forma kurdî ya pirjimar "herdu/êkdu" wekî *tesniye* (dujimar) qebûl kiriye lê wekî ku (Bülbül û Öztürk, 2020) derdibirre ew ne kategoriyeke cuda ye lê di nav kategoriya pirjimar de ye. Bi gotineke din dema em li nimûneyan dinêrin

xêncî rewşa yekjimar di kurmancî de kategoriya din pirjimar e, bi qewlî Reşîdê Kurd (1956, r. 41) ji yekê jortir pirjimarî ye.

Bi gotineke xwerû, ji aliyê mêjerê ve bi giranî du rehendên peyvan hene ku yek jê yekjimar ya din pirjimarbûna wan e. Di gelek zimanan de û di diyalektên kurdî de peyv bi serê xwe yan jî di rewşa xwe ya xwerû de dibin pirjimar lê di diyalekta kurmancî de pirjimarbûna peyvan di rewşa wan ya xwerû tuneye:

(1)

| **Ziman/diyalekt** | **yekjimar** | **pirjimar** |
|---|---|---|
| **Kurdî** | | |
| kurmancî | dar | darθ |
| soranî | dar | dare+kan |
| zazakî | dar | dar+i |
| hewramî | dirext | dirext+ê |
| **Tirkî** | ağaç | ağaç+lar |
| | ev | ev+ler |
| **Farsî** | seng | seng+ha |
| | pîser | pîser+an |
| **Îngilizî** | kid | kid+s |
| | child | children |

Ji nimûneyên jorîn jî diyar dibe, di kurmancî de peyv bi serê xwe bin nabine pirjimar. Di soranî de, pirjimariya peyvan di halê wan yê xwerû de wekî morfema standart {-kan} û di zazakî de Lezgîn (2013, r. 42) jî {-î}, di hewramî de Gulpî (2018, r. 227) jî {-ê}ye. Li vir em behsa varyantê van morfeman nakin ku wekî allomorf di devokên van diyalektan de hene.

Di tirkî de du morfemên pirjimariyê hene ku wekî {-lar} û {-ler} ji ber ahenga dengdêran du heb in û bi +lAr yan jî {-lAr} hatiye nîşandan.2 Di farisî de (Çiftci, 2013, r. 140) jî du morfemên standart ên pirjimarkirina peyvan/navan hene; “ ها{-ha} û ان {-an} ku wekî qayde, digel îstisnayan jî, piranî “-ha” tê dawiya heyînên necandar û “-an” jî tê dawiya heyînên candar û wisa ew têne pirjimarkirin. Di îngilizî de bi gotina Trask (2007, r. 191) pirjimarbûna navên jimarbar bi du şiklan çêdibe, yek bi paşgira "-s" bo nimûne: dog dibe dogs ya din jî morfemek wê ya standart tuneye, bo nimûne: child wekî children, cactus

[2] Di analîza morfolojîk a tirkî de, di gireyan de herfa gir A; herfên "a" û "e"yê, C; "c" û "ç"yê, D; "d" û "t"yê, H; "ı", "i", "u", û "ü"yê, I; "ı" û "i"yê temsîl dike. Sembola kevana vala hebe ew nîşan dike ku dikare di nava gireyê de tunebe. Binêre: Eryiğit, G. (2012). Biçimbilimsel Çözümleme. *Türkiye Bilişim Vakfı Bilgisayar Bilimleri ve Mühendisliği Dergisi*. 5 (2).

**Adres**
*RumeliDE Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*
Osmanağa Mahallesi, Mürver Çiçeği Sokak, No:14/8
Kadıköy - İSTANBUL / TÜRKİYE 34714
**e-posta:** editor@rumelide.com
**tel:** +90 505 7958124, +90 216 773 0 616

**Address**
*RumeliDE Journal of Language and Literature Studies*
Osmanağa Mahallesi, Mürver Çiçeği Sokak, No:14/8
Kadıköy - ISTANBUL / TURKEY 34714
**e-mail:** editor@rumelide.com,
**phone:** +90 505 7958124, +90 216 773 0 616

wekî cacti dibe pirjimar. Bi gotina Corbett (2004, r. 6) di îngilizî de mêjer (pirjimariya peyvan) piranî birêkûpêk e çunkî peyvên wekî dog ~ dogs zêdetir in ji peyvên wekî sheep ~ sheep û criterion ~ criteria. Digel van qaydeyan di zimanan de gelek rêkar hene ji bo pirjimarkirinê. Bo nimûne di erebî de bi rêya tewangê: xerîb dibe xureba, mekteb dibe mekatîb (Aksan, 2009, r. 95), di îngilizî û almanî de bi pêşdengdariyê: alm. mutter "dê" dibe, mütter "dê-pj."; ing. man "meriv" dibe men "meriv-pj." (Kerimoğlu, 2019, r. 170).

Îja kurmancî ji bo ku van rêkarên pirjimarkirinê nîşan bide, dibe nimûneyeke baş. Nimandin û nîşandana van rêkaran ew ê girîngiyeke zêdetir bide vê lêkolînê.

**Pirjimarkirina Peyvan di kurmancî de**

Pirjimariya kurmancî di asta xwerû ya peyvan ne tê de, di rewşên mîna tewang, îzafe, nasyarî-nenasyarî, banglêkirin ên morfolojiya navdêrî de û wekî mijareke morfolojiya lêkerî (*verbal*) di kişandina lêkeran de xwe dide der. Heta di rewşa xwerû ya peyvan de nebûna pirjimariya peyvan kurmancî ne tenê ji hin zimanên berbelav cuda dike, bi vê yekê wê ji diyalektên kurdî yên mîna zazakî û soranî jî cuda dike.

Heta niha di lîteraturê de pirjimarî wekî mijar di berhemên rêzimanî de cih girtine ku carna wekî xusûsiyeteke navdêrê carna di bin sernavê mêjerê de, carna jî pereşandî wekî xusûsiyetekê di mijarên têkil de behs lê bûye. Dema em li lîteraturê dinêrin em dibînin ku di hemî berhemên kurmancî yên rêzimanê de pirjimarî heye çi di nav mijaran de pereşandî çi jî wekî beşeke navdêrê.

Mela Mehmûdê Bazîdî pirjimariyê di mijara lêkeran û navdêran de hildide. Ew dema kêşana lêkeran li gorî hejmarê dide û hejmara navdêran jî wekî yekjimar, dujimar û pirjimar dike sê kategorî. Bazidî wekî gireyên pirjimariyê "-an", "-in" (wekî cînava kesandinê di pirjimarkirina lêkeran de) û "-êd" (di ravekê de) nimûne dide. Bazidî ji ber tesîra erebî dujimariyê wekî kategoriyeke cuda nişan dide halew kategoriyeke wisa di kurmancî de tuneye (Bülbül û Öztürk, 2020). Jardin (1922) ji morfemên pirjimariyê morfema {-et}, morfema {-an}, kopulaya paşklîtîk (enclitic copula) anku cînavên kesandinê ya paş-dengdar {-in} û paşdengdêr {-ne} wekî nimûne dide herwiha ew di jimarnavan de jî amaje bi pirjimariyê dike. Kurd (1956) wekî gireya pirjimariyê "-an"ê nîşan dide û li ser cînavan û lêkeran nimûneyên pirjimariyê dide. Badılı (1965) pirjimariyê di mijara nav, rengdêr ravek, tewang û baneşanê de dinimîne ku gireyên "-an, -ne, êd, -no" û hin varyantên wan nîmûne dide. Sağnıç (1991) di mijarên têkel de behsa pirjimariyê dike lê di babeta mêjerê de ew pirjimariyê dike pênc cure: bi gireyên; "–an, -na, -ên/êd/-êt, -ne/nê" û di lêkeran de pirjimarî.[3] Bedirxan û Lescot (2000) pirjimariyê: 1) Di navdêran de; a) bi rêkeftina digel lêkerê, b) bi gireyan, 2) Di cînavan de; a) bi cînavên kesî yên pirjimar, b) bi rekeftina cînavan ya digel lêkerê, c) cînava "hev" ku herdem pirjimariyê dixwaze, 3) Di rengdêran de; bi rengdêrên nîşanî yên pirjimar, 4) di lêkeran de jî li gorî qaydeyên rêkeftinê lêker gireyên kişandinê yên guncan werdigirin. Herwiha ew di nav çend mijarên din yên berhema xwe de morfemên pirjimariyê digel yekjimarên wan dide tevî hin varyantên devokî yên mîna "-en, "-inen" û ronî dide ser vê mijarê.

Dîsa Thackston (2006) pirjimariya kurmancî; di tewang, îzafe, cînavên pirjimar, rengdêrên nîşanî yên pirjimar, baneşan û di rewşa ergatîf ya kişandina lêkeran de û di jimarnavan de nîşan dide. Baran (2012) pirjimarkirinê di mijara navdêran de bi heşt awayan nîşan dide, wekî: bi gireya diyariyê "-an", bi îzafeyê (veqetandekê) "-ên", bi gireya nenasiyê "-in" û di ravekê de "-ine", bi cînavên pirjimar, bi rengdêrên nîşanî, bi cînavên kesandinê, bi gireya baneşanê û bi hejmaran. Li gorî Yıldırım (2012) pirjimariya

[3] Him Reşîdê Kurd him Kemal Badılı him jî Feqî Huseyn Sağnıç termînolojiyeke ciyawaz bi kar anîne ji bo cure û têgehan ku bi vê, ji xebatên din yên kurmancî cudatir dibin.

navdêran: 1) bi erka wan ya risteyê, 2) bi gireyên nenasyariyê, 3) bi gireya "-an" ku ew jî; dema dibe gireya bikera lêkerên têper di dema borî de, dema dibe gireya berkara lêkerên têper di dema niha de û dema dibe gireya berkara lêkerên têper di dema bê de, 4) wekî îzafe yan jî gireya ravekê "-ên" û varyanta wê ya Behdînî "-êd", 5) dema navê malbat yan jî komekê nîşan dide wekî "-anên", 6) navên taybet bi maneya mecazî dike pirjimar. Kurdo (2013) gireyên pirjimariyê wekî gireyên hevpendiyê "-êd" û "-ên", "-e" û varyanta wê ya din "-ne" dide. Herwiha ew di mijara jimarnavan de jî gireyên pirjimariyê "-an", cînavên nisbî "yên" yan jî "yêd" wekî nimûne dide. Ocek (2014) pirjimariyê li ser pirjimarkirina lêkeran û îzafeyê (veqetandekên binavkirî û yên nebinavkirî) nîşan dide. Tan (2015) pirjimariya navdêran bi lêkeran, bi gireyên tewangê û îzafeyê nîşan dide. Muhemmed (2016) dema taybetiyên pirjimariya kurmancî rêz dike; gireya tewangê "-an", gireyên ravekê "-ên" û "-êd" û varyatên wê û di hingama kişandina lêkeran de cînavên kesandinê yên pirjimar wek nimûne dide. Aslan (2018) pirjimariyê di navdêran de bi ravekê; di raveberê de li ser îzafeyê û di ravekerê de li ser tewangê, di tewangê de, di kêmravekan de (îzafeya wekî morfema azad yan jî cînava xwedîtiyê), di jimarnavan de, di bangkirinê de nîşan dide. Ciwan (2021) jî pirjimariyê wiha nîşan dide: 1) li ser gireya tewangê "-an" (wextê biker in di dema borî ya lêkerên têper de, wextê berkar in di dema niha û bê ya lêkerên têper de), 2) dema digel daçekan têne bikaranîn, 3) di ravekê de.

Xêncî van xebatên navhatî hin xebatên din jî hene ku behsa vê mijarê kirine, bo nimûne: Xebata Aslanoğulları (2017) ya danberheva pirjimariya kurmancî û zazakî û nivîseke Eroğlu (2015) ya di hin nimûne ne behsa pirjimariya kurmancî dikin.

Îja ev xebat armanc dike bi kûrahî pirjimarkirinê û rewşên pirjimar yên kurmancî yên morfosentaktîk nîşan bide herwiha xusûsiyetên xasî kurmancî nîşan bide ku hinek ji wan heta niha ber çavan neketine yan jî girîngî pê nehatiye dan.

## 1. Morfemên Pirjimariyê yên Bestî

### 1. 1. Gireya cînava kesandinê ya pirjimar n/in/ne:

Dema lêkerên kurmancî têne kişandin ew li gorî pirjimariya biker an jî berkarê rêkdikevin. Karê risteyê eger kesekî kiribe bikera wê yekjimar, eger du kes an zêdetirê wan, kiribe hingê biker dibe pirjimar. Biker eger cînavên kesî bin; di yekjimariya kirina karî de lêker cînavên yekjimar cuda dike lê di pirjimariya kirina karî de cînavên pirjimar hersêk jî bi heman morfema cînava kesandinê digirin.

(2)

a) Zarok çû.

b) Zarok çûn.

c) Pale dixebite.

d) Pale dixebitin.

e) Mêvan hatiye.

f) Mêvan hatine.

Di rewşa 2a û 2byê de lêker di rewşa dema borî de hatiye kişandin ku li gorî kişandina lêkerê mêjera navdêra "zarok"ê wekî biker diyar dibe çendî herdu di rewşa bêmorfemiyê (zero morfem) de xuya bikin jî. Rehên lêkerên kurmancî dema bi dengdêran diqedin, bn: "çû, da, revî, bezî"..., gireya -n werdigirin ku di hin lêkerên têneper de varyanteke din jî heye ku wekî -an bi bikerê re dikeve rêkeftinê, wekî: "reviyan, beziyan, geriyan...". Di rewşa 2c û 2dyê de lêker bi dema niha û 2e û 2fyê de bi dema borî ya

nediyar hatiye kişandin. Di hersê deman de jî wekî ku xuya dike ji ber pirjimarkirina lêkerê mêjera bikerê diyar dibe. Bi vê ferqa cînava kesî ya sêyem tê dabînkirin ku di kurmanciya standart de herdu cînavên kesî yên 3yem eynî ne.

**1.2. Gireya îzafeyê ya pirjimar ên/êd/ine/anên/gelan:**

Yek ji rêya pirjimarkirina peyvan di kurmancî de girêdana wan ya bi peyveke din re ye ku peyv di ravek yan jî frazan de dibin pirjimar çi diyar çi jî nediyar bin, hingê zayenda peyvan jî radibe.

(3)

a) Darên gûzê

b) Mirovêd me

c) Maline gund

d) Xalanên min

e) Xezûrgelanên min

Di rewşa 3ayê de gireya ravekerê anku îzafe pirjimar e ku di gelek devokên kurmancî de dengê dawî jê dikeve û wekî bi vê nimûneyê bê nîşandan, bi şiklê; "darê gûzê" bi lêv dibe. Di 3byê de wekî allomorfeke îzafeya pirjimar {-êd}berbelav bi kar tê di Devoka Behdînan û hin deverên nêzîkî wê û li nav kurdên Ermenistanê. Herwiha varyantên vê gireyê wekî "-êt" dîsa di bindevokê Behdînî de li kar in. Taybetiyeke morfema {-êd} jî ew e ku helbesta klasîk de him bi vî şiklî hatiye bikaranîn hem jî wekî morfemeke azad bi şiklê "di" bi kar hatiye. Bo nimûne Xanî (2009) di Mem û Zînê de li çend cihan vê morfemê wiha bi kar tîne:

"Hersê weledê di pir mewalîd

Xebra û sema digel meqalîd" (2/10)

"Kurmanc ne pir di bê kemal in

Emma di yetîm û bêmecal in" (6/11)

"Tacdîn du bira hebûn di qellaş

Manendê du şahbazê cemmaş" (10/14)

"Hikmet ew e ev hemî li kar in

Hindek di peya û hin siwar in" (11/5)

Ji van malikên jorîn jî diyar dibe; morfema azad "di" pirjimariyê nîşan dide ku di malika (2/10) an de pirjimariya peyva weledê wekî "weledêd", di herdu malikên (6/11)an de wekî cînava xwedîtiyê/pêwendiyê ya pirjimar "yêd", di ya (10/14)an de pirjimariya peyva birayî wekî "birayêd" û di ya (11/5)an de jî pirjimara cînava nediyariyê hindekê wekî "hindekêd" nimûneyên vê yeke ne. Bi vî teherî ev morfem wekî rewşên xwe yên girêyî û yên azad karakterê xwe yê klîtîkî nîşan dide.

Wekî Xanî Melayê Cizîrî (2012)jî cih dide vê morfeme ku ev jî çend nimûne ji şiira Melayî ne:

"Eksa ji husna meyfiroş avête fincanên di boş

Mey lew di caman hate coş fûrî di nêva kûze da" (1/88)

"Dil ji hewaya te di fikrên di kûr

Fi lucecin beyne hubûbî'r-riyah" (26/3)

"Muhbetê mihnet di zor in hub dibêm beşek bela ye

Umr û jî xweş pê diborin sotin û derd û cefa ye" (67/1)

Di malikên şiira Melayî de; morfema azad {di}pirjimariyê dide peyvên; bi rêzê, fincan, fikr û muhbetê ku ji encama dercihiyê li şûna formên peyvan yên wekî "fîncanêd, fikrêd, muhbetêd" hatiye tercîhkirin.

Herwiha Feqiyê Teyran (Sadînî, 2020, r. 214) jî ev morfem wek nimûne wiha bi kar aniye:

"Ne çîçek man ne asmîn man
Ne rozanê di rengîn man
Ne goyanê di xweşxwîn man
Ne Nîsan man ne Adar e."

Di çarîna Feqîyî de morfema azad "di" li herdu cihan jî wekî pirjimariya peyvan bi kar hatiye ku şiklên vê morfemê wekî "rozanêd" û "goyanêd" e.

Wekî helbesta klasîk di berhemên folklorîk yên kurmancî de; di klamên dengbêjan de û di berhemên kurdên Kavkas de jî ev morfem berjiyan e. Bo nimûne di kilameke Dengbêj Şakiro de ev morfem bi heman awayî wiha bi kar hatiye:

"...
Terzê di hakimî, şemlê di erebî
Xal û xetê di gerdenê, xebxebkê ber guhara
..." (Yıldız û Taşkın, 2018, r. 231)

Îja di xebatên kurmancî de wekî varyanteke îzafeya pirjimar yan jî wekî varyanteke pirjimara cînava xwedîtiyê/pêwendiyê "ên/yên"ê morfema "êd" digel guhertoya xwe ya wekî morfema azad "di" tê nimandin (Bedirxan û Lescot, 2000; Kurdo, 2013; Tan, 2015; Ciwan, 2021).

Derbarê vê morfemê de Bedirxan û Lescot (2000, r. 106) dibêje: "*di* daçek e ku beramberî gireyên ravekê *-ın*, *-in*, *-nın*, *-nin* yên tirkî ye û hin rojhilatnas li ser wê fikrê ne ku ev *di* ji aramî hatiye wergirtin." Kurdo (2013, r. 85-6) ji bo vê morfemê û varyantên wê, digel nimûneyên berhevok û xebatan, deverên wekî Diyarbekir, Mêrdîn, Hekarî, Bana, Tiblîs, Mûş, Bazîd, Ermenistan, Badînan, Bingerd, Pijder û Mukriyanê nimûne dide. Tan (2015, r.153) destnîşan dike ku wekî morfema azad "di"ya kurmancî di diyalekta zazakî de jî heye ku carna digel cînav û hokeran bi kar tê.

Li gorî Açar (2022) wekî "di" du morfemên azad hene di kurmancî de: 1) daçeka cih, 2) morfema pirjimariyê ku ya 2yem bi dercihiyekê çêbûye (r.104). Eger em vê rewşa guherbar ya klîtîkî li ser devoka Behdînî nimûne bikin ew dê xwe wiha nîşan bide:

Du birayêd min hene. > Min du bira yêd heyn. > Min du bira di heyn.

Rewşa 3c îzafeya nediyariyê nîşan dide ku niha di kurmancî de piranî cînava nediyariyê "hin" şûna wê li kar e. Anku "Hin(e) malên gund" berbelavtir e ji varyanta "Maline gund". Bi vê bikaranînê morfema "-ine" û varyanta wê ya azad "hin" dibin nimûneyeke baş ji bo klîtîkê.

Li aliyekî din, wekî îzafeyên mayîn ne berbelav bin jî yên rewşa 3d û 3eyê, xusûsen di pabendî eqrebatiyê de pirjimariyê nîşan didin. Di kurmancî de -anên û -gelan dema wekî klîtîk tevdigerin şiklê xwe yê azad bi cînava pirjimariyê "wan" rêk dikeve bi ravekê re ku hingê îzafe diyar û yekjimar dibe:

"Xalê min wan têne mêvandariya me."

"Gundê bûrayê min wan nêzîkî vir e."

### 1.3. Gireya tewangê ya pirjimar an/inan:

Dema peyvên kurmancî ditewin ew di rewşa pirjimar û diyar de morfema {-an} ya nediyar de jî morfema {-inan} werdigirin.

(4)

a) Zarokan cam şikand.

b) Carinan ew tê serdana me.

Di kurmancî de dema navdêr ditewin di rewşa diyar, yekjimar û nêrza de morfema {-î}, di ya diyar, yekjimar û mêza de morfema {-ê} digirin. Herwiha di rewşa nediyar, yekjimar û nêrza de morfema {-ekî}, di ya nediyar, yekjimar û mêza de morfema {-ekê} digirin. Di rewşa pirjimariyê de çi diyar çi jî nediyar, zayend radibe. Rewşa 4a pirjimariya zarokan nîşan dide ku zarok ji aliyê guhêzer ve tê zanîn. Di (b)yê de jî gireya zayendê ya nediyar û pirjimar {-inan} ne zêde likar be jî bi şiklê morfema "hin" wekî cînava kesî ya nediyar bi kar tê ku hingê rewşa wê ya klîtîkî dinimîne: "Hin caran tê serdana me."

Li aliyekî din, di kurmancî de wekî agahiyeke melûm e ku morfema pirjimariyê "-an" di nisbetkirinê de wekî; "edetê mislimanan, çanda kurdan…", navê eşîr û deveran wekî; "Milan, Berzan, Botan, Xerzan…", û di rewşa navdêran ya derketinê/dûrketinê (*ablatîv*) de wekî; "Ew ji zozanan dageriyan." li kar e.

### 1.4. Gireya pirjimar ya baneşanê no/ino:

Di hingama banglêkirinê de, peyvên yekjimar yên banglêbûyî zayendê nîşan didin lê dema pirjimariyê de zayend radibe û ew gireya pirjimariyê werdigire. Di banglêkirinê de eger navdêr bi dengdarê biqede morfema {-ino}, bi dengdêrê biqede {-no} werdigire.

(5)

a) Hevalino! kê bi min re tê?

b) Birano dembaş!

Di hingama banglêkirinê de bi kurmancî eger morfemên pirjimariyê neyê bikaranîn şûna wan piranî mofema {gelî} tê bikaranîn, wekî: a) Gelî hevalan!, b) Gelî birayan dembaş! Li jêr, di beşa 3ayê de ev mijar tê geşkirin.

## 2. Morfemên Azad ên ku Pirjimariyê Çêdikin

### 2.1. Gel/gelî

Ev morfem him wekî peyv pijimariya kesan diyar dike û di maneya xelk, cimaet de bi kar tê him jî wekî paşgir pirjimariyê nîşan dide di kurmanciya jor û ya jêrê (soranî) de. Li deverên derdora Sineyê ev paşgir likar e ku dengdêrê bestînê "-e" dikeve navbera navdêr û paşgirê. Bo nimûne "Kuregel", "Kiçegel" (Fossum, 1916, s. 32). Di kurmanciya jor de jî {-gel} digel morfema {-an} bi kar tê.

(6)

a) Xezûrgelanê min ji Wanê ne.

b) Bûragelanên wî jê xeyidîne.

c) Gelî gundiyan, gotineke min heye ji bo we.

Di rewşa 6cyê de jî morfema pirjimarkirinê gelî digel navdêra pirjimar bi kar hatiye ku navdêrê gireya tewangê "-an" girtiye. Wekî li jor jî behs lê bû; xusûsiyeteke vê morfemê jî ew e ku rêkeftinê digel navdêra banglêbûyî bi halê wê yê pirjimar saz dike.

## 2.2. Cînavên Kesî yên Pirjimar

Wekî di binbeşa 1em de behs lê bû, cînavên kesî yên pirjimar bi rêkeftina digel lêkerê ve pirjimariyê nîşan didin.

(7)

a) Em diçine ser kar.

b) Hûn çi dikin?

c) Ew xweş dixwînin.

Wekî ji nimûneyan jî diyar dibe, di hersêyan de jî cînavên kesî bi kişandina lêkeran ku hersê jî cînavên kesandinê yên pirjimar wergirtine, li hev dikin û pirjimariyê nîşan didin. Xusûsen di 7cyê de jihevkirina cînava "ew" bi xêra kişandinê çêdibe çendî formen wê yên devokî yên mîna "ewna, ewana" li kar bin jî. Li aliyekî din di rewşa ergatîf de lêker li gorî berkarê teşe digire ku lêkera risteyê têper be:

(8)

a) Me darek av da.

b) Me du dar av dan.

c) We xalîçeyek daxist.

d) We pênc xalîçe daxistin.

e) Wan biryarek wergirt.

f) Wan hin biryar wergirtin.

Wekî ku ji nimûneyan diyar dibe dema lêker tê kişandin mêjera kesê lêkerê di dema niha de li gorî mêjera cînavê teşe digire ku cînav/biker pirjimar be ew jî dibe pirjimar. Di dema borî de bi lêkerên têper jî lêker digel berkarê rêkeftinê datîne û eger berkar pirjimar be ew jî gireya pirjimar werdigire. Ji ber ku rola cînavên kesandinê diyar bû me ew di nav cînavên kesî de nirxand û musteqîl nexiste nava binbeşekê.

Wekî wê cînavên hevbeşiyê hev û êk jî wekî ku Bedirxan û Lescot (2000, r. 89) derdibirre herdem pirhimariyê çêdike. Ji bo ku ev cînav piranî digel cînavên kesî yan jî navdêran tê bikaranîn me ew nekir kategoriyeke cuda.

## 2.3. Cînavên Xwedîtiyê/Pêwendiyê

Cînavên xwedîtiyê yên kurmancî wekî klîtîk hem rewşên xwe yên azad anku peyvî hem jî rewşên xwe yên gireyî hene. Dema wekî morfemên bestî tevdigerin ew dibine gireyên ravekê (raveberê) ku wekî îzafe jî tê binavkirin. Lê dema ew wekî morfemên azad tevdigerin dikarin bêne serê ravekê jî û dikarin di raveka zincîrîn de bi ravekê ve jî bêne girêdan

(9)

a) Ên min çar heb in.

b) Hevalên min (y)ên polê

c) Malên me ne fireh ên li gund çi xweş in!

Di nimûneya 9ayê de ku kurmancî de wekî "yên" li kar e, cînava xwedîtiyê wekî morfema azad dema dibe biker rêkeftinê ligel lêkerê saz dike di pirjimariyê de. Di 9byê de, fraza navderî anku raveka cînavî bi cînava xwedîtiyê ya pirjimar ve hatiye girêdan, bi vê, awayê standart yê peyvrêziya kurmancî nîşan dide di ravekê de. Di binbeşa vê gotarê ya "1.2."yê de me bal kişandibû li ser du varyantên cînava xwedîtiyê ya pirjimar ku guhertoyên deverî ne tê de, ew wekî "ên/yên" û "êd/yêd" du heb in. Tan (2015, r.153) dibêje: "di kurmanciya berê de ji bo nîşandana xwedîtiyê daçeka "di" hatiye bikaranîn ku Bedirxan û Lescot (2000) jî morfema pirjimar "di"yê wekî daçekê bi nav dikin.

Di rewşa 9cyê de jî raveka cînavî bi rengdêrekê re hatiye girêdan bi formeke deverî ya cînava xwedîtiyê ku ev awayê pirjimar digel awayê yekjimar û nêrza "î" û yekjimar û mêza "e" li Devera Sîpan li kar e.[4] Dîsa cînava xwedîtiyê "ên" wekî îfadeyeke *nominal* hokerek girtiye ku hingê bi forma xwe ya standart hatiye girêdan. Ev jî nîşan dide formên van cînavan yan jî îzafeyên azad dema ravekê bi rengdêrekê ve girêdidin bi kar tên.[5]

## 2.4. Cînav û Rengdêrên Nediyariyê yên pirjimar

Derbarê cînavên nediyar de, di nav lêkolîneran de fikren ciyawaz hene. Bo nimûne Kurdo (2013) cînavên wekî "her, heryek, herkes, hemû, gişt, gişk, tev" wekî cînavên diyar qebûl dike, cînavên wekî "kes, tişt, hin/hindek, çend/çendek jî wekî nediyar qebûl dike.

(10)

a) Gelekan ew xeta kirine.

b) Hinekan ez gilî kirime.

c) Hemûkan karê xwe qedand.

d) Kîjanan ew xeber şandiye?

e) Hinan/Hin kesan behsa min kiriye/ne.

f) Çend(ek)an barên xwe li jêr hiştin.

Ji nimûneyan jî diyar dibe ku cînavên nediyariyê wekî cînavên kesî yên pirjimar tevdigerin, dema ew dibine biker lêker li gorî berkarê teşe digire ku ev bi rewşa ergatîf re hevaheng e. Wekî ku Tan (2000, r.150) jî diyar kiriye di rewşa xwerû ya van cînavan de mêjera wan wekî cînavên din li gorî kesandina lêkerê çêdibe. Eger em bînin lêkerê li gorî dema niha bikişînin hingê cînav xwerû dimînin û berkara risteyê ditewe. Bo nimûne: "Gelek wê xetayê dikin., Hinek giliyên min dikin., Kîjan wê xeberê dişine?"

Li aliyekî din rengdêrên nediyariyê berî navdêra têkilî xwe tên û him wekî cure û him jî mêjer neguherî dimînin (Bedirxan û Lescot, 2000, r. 265).

4 Binêre: Açar, Z. (2015). Devoka Devera Filistanê, Teza Mastirê ya Neçapkirî, Zanîngeha Bingolê Ziman û Edebiyata Kurdî, Bîngol.

5 Binêre: Berdestî, Z. (2014). Qertafên ku Ravekê bi Hevalnavan ve Diwesfînin, Kovara Nûpelda, hj. 15

(11)

a) Gelek kesan karê xwe kiriye.

b) Hin kesan ew dîtiye.

c) Hemû hevalan em pîroz kirin.

Di nimûneyên li jor de wekî ku tê dîtin rengdêrên nediyariyê digel navdêrê pirjimariyê saz dikin. Di nimûneya 11a, 11b û 11cyê de navdêra modifiyekirî eger ji risteyê bê derxistin morfema wê ya pirjimar digel rengdêrê cînava nediyar ya pirjimar saz dike, wekî, "gelekan, hin(ek)an, hemûkan/hemûyan". Dîsa wekî di nimûneyên 10ê de amaje pê hatibû kirin, di rengdêrên nediyariyê de jî li gor kişandina lêkerê, bi dema wê, tewanga biker û berkarê teşe digirin di çarçoveya sîstema ergatîf ya kurmancî de. Loma di nimûneyên 11a, 11b û 11cyê de ji bo ku lêkerên wan têper in û li gorî dema borî hatine kişandin, bikerên wan tewiyane û berkarên wan xwerû mane. Berkara nimûneya 11a ji ber tesîra cînava vegerok "xwe"yê di herdu deman de jî xwerû dimîne anku guherînek lê çênabe: "a) Gelek kesan karê xwe kiriye." Lê di herdu nimûneyên 11b û 11cyê de bikerên wan xwerû ne û berkar ditewin: "b) Hin kes wî/ê dibînin, c) Hemû heval me pîroz dikin."

## 2.5. Rengdêrên nîşanî yên pirjimar

Di rewşa xwerû de cînavên "ev, ew" û ya tewandî de "vî/ê, wî/ê, van, wan" dema navdêrê modîfiye dikin ew dibin rengdêrên nîşanî. Di rewşa xwerû de cînav li gorî rêkeftina navdêr û lêkerê teşe digire. Di rewşa tewandî de jî cînava pirjimar ya tewandî, navdêra piştî xwe jî ditewîne û wê jî dike pirjimar. Wekî ku Bedirxan û Lescot (2000, r. 257) derdibirre rengdêrên nîşanî herdem berî wê navdêrê tê ku pê re rêkeftineke cureyî, jimarî yan jî rewşî daniye. Anku eger cînav/rengdêr yekjimar be ji ber yekjimarbûna navdêrê ye, eger pirjimar be ji ber pirjimarbûna navdêrê ye. Herwiha di yên tewandî de cînav/rengdêr kartêker e li ser tewang û mêjera navdêrê, wekî di van nimûneyan de heye: "vî/wî mêrîkî…, vê/wê jinikê…, wan zarokan.."

(12)

a) Ev dar şitilek bû du sal berê.

b) Ev zarok xwendevanên min in.

c) Van camêran karê xwe baş kiriye.

d) Wan salan ceyran hêj nehatibû gund.

Ji nimûneyan jî diyar dibe ji hêla mêjerê ve rengdêrên xwerû û tewandî li gorî navdêrê dişekilin. Nimûneyên 12a û 12byê rengdêrên nîşanî yên xwerû û nêzîk nîşan didin ku yên dûr; ew-yj. û ew-pj. bi heman erk û fonksiyonê radibin loma me ew wekî nimûne nîşan nedan. Divê bê gotin, di devokên kurmancî de varyantên wan yên "evna/evana, ewna/ewana" li kar in. Di 12c û 12dyê de wekî ku jorê jî hatibû berîdan, rengdêrên nîşanî navdêran adapteyî rewşa xwe dikin ku di van herdu nimûneyan de ji ber ku pirjimar in nevdêrên dû xwe jî kirine pirjimar û ew tewandine.

## 2.6. Jimarnavên Pirjimar

Jimarnav (tr. *sayı*, ing. *number*, *numerals*, *plurality*); kategoriyeke rêzimanî ye ku di hin zimanan de ne wekî babeteke serbixwe, di hin zimanan de jî têkilî morfolojiya nominal wekî cureyeke peyvan hatiye nirxandin ku bo nimûne (Toklu, 2021, r. 81) dibêje di almanî de ev wekî cureyeke peyvan a cuda ye. Di kurmancî de, bi navê mêjerê mijareke serekî heye çunkî di gramera kurmancî de pirjimarbûn bi rewşên mîna tewang, îzafe û zayendê (di nebûna wê de) re jî eleqedar e û cihekî girîng digire. Ji ber vê girîngiya

xwe di morfolojiya nominal de, di gelek berhemên kurmancî yên gramerê de bi navê jimarnavê wekî babeteke xusûsî hatiye behskirin.

Di beşên berê de, me morfemên azad yên pirjimariyê çêdikin li ser hin cureyên cînav û rengdêran nimûne kiribû. Herwiha heta vê derê diyar bû ku navdêr, di kesandinê de lêker, hin cînav û rengdêr û baneşanên banglêkirinê dikarin bibin pirjimar. Loma di vê binbeşê de em ê nekevine nav hûrgiliyên wan mijaran.

Wekî dabeşkirina îngilizî di kurmancî de jî jimar wekî jimarên bingehîn (*cardinal*) û jimarên rêzîn (*ordinal*) bûne du kategori. Di senifandina jimaran de, di berhemên rêzimanê yên kurmancî de; (Bedirxan û Lescot 2000; Kurdo, 2013; Tan, 2015; Huseîn, 2016; Ciwan, 2021) curedariyek hebe jî, ji ber ku lêkolîna me li ser pirjimarbûna peyvan hûr dibe, em ê tenê têkilî pirjimariyê nimûneyên xwe bidin loma dabeşkirina Ciwan (2021, r. 237-242) em ê bingeh bigirin û nimûneyên xwe wisa pêşkêş bikin.

Di pirjimarkirina jimaran de, wekî ku Muhemmed (2016) jî tîne ziman; "sazkirina formên pirjimar yên jimaran wekî yê navdêran e." Di kurmancî de hejmarên jimartinê dema gireyekê werdigirin hejmara yek teşeya mêza û yekjimariyê werdigire, ji duduyan heta nozdehan gireya pirjimariyê werdigire, bîst û qatên wê yên dehî gireya nêrza û yekjimar werdigire û hejmarên lêkdayî jî li gorî hejmara dawî dişekile (Bedirxan û Lescot 2000, r. 249). Eger em vegerin li ser kategorîkirina Ciwanî (2021) ku berî hingê me berî dabûyê, wekî; jimarên bingehîn (yên jimartinê), jimarên dabeşkirinê (yên parîneyî), jimarên rêzê û jimarên hevalkarîn (hokerî) dibin çar kategori.

(13)

a) Yekê bîne.

b) Yek meriv hat.

c) Merivek hat.

d) Du meriv hatin.

e) Çil û çar darên me hene.

Wekî ku ji nimûneyan jî diyar bûye; di 13ayê de ji ber jimara 1ê yekjimarî li kar e ku di hin devokên kurmancî de ew wekî "yekî" jî ditewe. Eger peyva "yek" cînav be hingê li gorî zayendê teşe digire: 1) Yekî got., 2) Yekê got. Di 13byê de "Yek" rengdêr e û ji ber ku di kurdî de nenasyarî jî bi wê çêdibe di 13cyê de wekî klîtîk tevgeriyaye û him nenasyarî him jî yekjimarî daye navdêrê. Di rewşên 13d û 13eyê de jî jimarnav ku wekî jimarên bingehîn in û ji aliyê cureya peyvê ve jî rengdêr in, ji ber ku pirjimar in bi lêkerê re rêkeftina mêjerî saz kirine û lêker bi formê xwe yê pirjimar hatiye kişandin.

(14)

a) ji dehan yek

b) ji çaran du

c) yeka sedan

d) heftê çilan

Nimûneyên li jor jimarnavên parîneyî ne, 14a û 14b formê pirjimar yê jimaran nîşan dide û wekî xusûsiyeteke tewanga kurmancî ya "daçek navên piştî xwe ditewînin" dinimîne. 14c û 14de formeke cuda ya parkirinê ye ku Kurdo (2013, r. 109) nimûne dane.

(15)

a) (y)ê/(y)a yekê

b) (y)ê/(y)a pêncan

c) (y)ên heftan

d) (y)ê/(y)a yekem/emîn

e) (y)ê/(y)a şeşem/emîn

Ev nimûne jî jimarên rêzkirinê ne ku di kurmancî de jimara yek ne tê de jimarên din hemî wekî pirjimar ditewin. Cînava ravekê li gorî zayendê û li gorî dengê dawîn yê peyva berî xwe dişekile. Wekî 15cyê de jî hatiye nimandin cînav dikare pirjimar be di hingama rêzkirina komî/grûpkirinê de. Di rêzkirina jimarên kurmancî de bikaranîna morfemên {-em} û {emîn} jî niha li kar e ku pêşniyaza "Rêbera Rastnivîsê ya Komxebata Kurmancî"yê jî ev morfem e ku 15d û15e wê dinimînin. Ji nimûneyan jî diyar dibe ku morfem di jimara yekê û yên pirjimar de naguhere.

(16)

a) Ew yek bi yek derketin.

b) Zarok çar bi çar dileyîzin.

c) Birayê min yeko yeko dijmire.

d) Wî tirî du lib du lib dixwar.

Ji nimûneyên li jor jî diyar dibe; pirjimariya lêkeran ji rêkeftina biker-pêveberê saz dibe. Di nimûneya 16a, 16b, 16cyê de lêkerên netêper û di 16dyê de jî lêkera têper bi vê qaydeyê saz bûne. Di 16dyê de formê pirjimar ya lêkeran jî heye di devokan de.

Xêncî van, herçend pirjimarkirina hokeran rewşeke ne berbelav be jî di hin hokerên demê de pirjimarî mumkîn e herwiha bi morefam {-ane} ya hokersaz jî navdêra hokerê bi formê pirjimar saz dibe. Bo nimûne:

(17)

a) Carinan ew li peravê digere.

b) Êvaran gundî qehweya gund kom dibin.

c) Ew camêrane tevdigere.

Di nimûneyên li jor de; 17a rewşa tewandî ya nediyar û 17b rewşa tewandî ya diyar ya peyva nominal nîşan dide. Di 17cyê de jî gireya pirjimar "-an" ku di ziman û diyalekte îranî de berbelav e, maneya "wekî" dide navdêrê ku di kurdî û farsî de bi pirjimariya navdêr yan jî rengdêrê: "wekî mêran, wekî dilêran" lê di tirkî de bi yekjimariya peyvê saz dibe: "*erkek gibi* (*erkekçe*), *cesur gibi* (*cesurca)"*.

Wekî encama vê binbeşê hin tesbît û pêşniyazên Rêbera Rastnivîsê hene ku em ê yên têkilî pirjimariyê li vir biguhêzin û mijara xwe wisa biqedînin:

> 1) Ji "du"yan heta "nozdeh"an hejmar bi "-an"ê ditewin: "ji duyan, ji sêyan, ..., ji nozdehan" 2) Hejmarnavên ji duyan heta nehan di dawiya kîjan hejmarnava mezin de bin dîsan bi "-an"ê ditewin: "ji bîst û duyan, ji nod û nehan, ji neh sed û heftan…" 3) Hejmarên bi "-an"ê ditewin navdêran dixin bin hukmê xwe: "bi du zêran, bi sê dolaran, bi nozdeh hespan…" 4) Di hejmarên nesade de (hevedudanî) tewang li gorî hejmara dawî ye; hejmara dawî yek be wekî "yekê", bîst û carên wî yên dehane be bi "î"yê ditewe. Eger hejmara dawî pirjimar be jimarnav jî dibe pirjimar: "ji bîst û yekê, ji hezar û sedî, ji çil û çaran, ji pêncî û pêncan…" 4) Hezar, mîlyon, mîlyar û carên wan yên dehanî li gorî hejmara pêşî ditewin: "bi sê hezaran, bi bîst milyonî, bi çar mîlyaran…"

**Encam**

Pirjimarî wekî mijareke serekî ya morfolojîk û morfosentaktîk girîngiya xwe heye ku di zimanekî mîna kurdî de ji bo ku wekî mêjer babeteke serekî ye û wekî cureya peyvê jimarnav karîger e, di peyvrêziyê de hêja ye bikeve ber xebat û lêkolînan. Ev xebata hane jî ji ber van egeran hate kirin ku di encamê de hin xalên girîng û yên serekî yên ku derketine pêş ev bûn di diyalekta kurmancî ya kurdî de:

1. Di rewşa wan a xwerû de, bereksê soranî, hewramî û zazakî, pirjimariya peyvan tuneye di kurmancî de.

2. Mêjer wekî kategoriya rêzimanî dijberiya yekbûn û pirjimarbûnê temsîl dike ku di kurmancî de du kategorî hene: yekjimar, pirjimar (cot, dujimarî jî di nav de)

3. Bi rêya ravekê anku gireyên îzafeyê, tewangê, bi kişandina lêkeran û rewşa banglêkirinê pirjimarî pêk tê di kurmancî de.

4. Cînavên kesandinê yên pirjimar ji bo hersê cînavan jî heman gire ne çi di kişandina lêkeran çi jî wekî kopûla di risteyên navderî de bin.

5. Bi qasî ku me tesbît kir; yên hev-erk jî di nav de, morfemên pirjimariyê ev in: {-n},{-in},{-an},{-ine},{-ne}, {-ên},{-êd}, {dî}, {-inan},{-anên},{-no},{-ino}. Ji van morfemên {-n}/{-in},{-ine}/{-ne} û ,{-no}/{-ino} ji ber dengê dawî yê peyva xwe teşe digirin ku meriv dikare bêje ew her cotek di eslê xwe de morfemek e.

6. Morfema {-êd} varyanteke{-ên}ê ye ku wekî morfema pirjimariyê ya azad {di} di şiira klasîk de û di dengbêjiyê de li kar e.

7. Morfema bestî "gel" di soranî de li kar e wekî gireya pirjimariyê lê di kurmancî de, di hin grûpên eqrebatiyê de digel morfema {-an}ê tê bikaranîn. Wekî morfema azad jî bi şiklê "gelî" baneşan e û navdêra dû xwe dike pirjimar û kombûn û pirbûna cîvata mixatab dinimîne.

8. Morfemên pirjimarî yên kurmancî klîtîk in: Gireya "-ine" û cînava nedîyarî "hin", gireya "-an" û cînavên kesî yên pirjimar ên tewandî "van, wan", gireya "-ên" û cînava xwedîtiyê "yên", gireyên cînavên kesandinê yên pirjimariyê û cînavên kesî yên pirjimar nimûneyên baş yên klîtîkan nîşan didin.

9. Cînavên hevbeşiyê "hev" û "êk" dema digel hev bi kar tên cînavên kesî dikin pirjimar. Bi gotineke siviktir; ew bi cînavên kesî yên pirjimar re bi kar tên.

10. Pirjimarî zayendê ji holê radike di kurmancî de.

**Jêder**

Açar, Z. (2015). *Devoka Devera Filistanê* (Nimroya weşanê: 384119) [Teza Lisansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê]. https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/tezSorguSonucYeni.jsp

Açar, Z. (2022). Şêwaza Zimanî di Mem û Zînê de. A. Timurtaş, A. Tek, H. Özdaş, & M. Acar içinde, Xanînasî. Wan: Peywend.

Aksan, D. (2009). *Her Yönüyle Dil-Ana Çizgileriyle Dilbilim II*. Cild. Ankara: Türk Dil Kurumu.

Aslan, Ş. (2018). *Lêkolînek li ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*. İzmir: Na.

Aslanoğulları, M. (2017, 12 30). *Zazaca ve Kurtçede Çoğulluk*. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, s. 63-80.

Badıllı, K. (1965). *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri* (*Kurmançça Lehçesi*) . Ankara: Ankara Basım ve Ciltevi.

Baran, B. (2012). *Rêzimana Kurmancî*. Diyarbekir: Belkî.

Bedirxan C. (2010 ). *Bingehên Gramera Kurmancî*. Stenbol: Avesta.

Bedirxan C. û Lescot, R. (2000). *Kürtçe Dilbilgisi* (Kurmanci). İstanbul: Doz, çapa 5an.

Berdestî, Z. (2014). *Qertafên ku Ravekê bi Hevalnavan Diwesfînin*. Nûpelda. Hj. 15.

Bülbül, M., & Öztürk, M. (2020). *Berhema Mela Mehmûdê Bazidîyî Kêşana Karên Kurdî*. Diyarbakır: Weqfa Mezopotamyayê.

Ciwan, M. (2021). *Turkçe Açiklamali Kurtçe Dilbilgisi/Rêzimana Kurdî bi Şirovekirina Tirkî*. Wan: Lorya.

Cizîrî, M. (2012). *Dîwan*. Stenbol: Nûbihar.

Corbett, G. G. (2004). *Number*. Cambridge: Cambridge University Press.

Eroğlu, Y. (2015). *Di KurmancÎ de PirjimarÎ*. Nubihar, 70-72.

Eryiğit, G. (2012). *Biçimbilimsel Çözümleme*. Türkiye Bilişim Vakfı Bilgisayar Bilimleri ve Mühendisliği Dergisi.

Fossum, L. O. (1916). *A Pratical Grammar*. Minneapolis: Augsburg Publishing House.

Gulpî, N. (2018). Razwanû Hewramî.

Jardine, R. (1922). *Bahdinan Kurmanji*. Baghdat: Goverment Press.

Kerimoğlu, C. (2019). *Genel Dilbilimine Giriş-Kuram ve Uygulamalarla Göstergebilim ve Türkoloji*. Ankara: Pegem Akademi.

Kızıl H. (2019). '*di ya Kirpandinê/Tekîdê di Kurmancî de'*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Sal: 5, Cild: 5 Jimar: 10, r. 47-74

Kurd, R. (1956). *Rêzman a Ziman ê Kurmancî*. Çapxaneya Kerem.

Kurdo, Q. (2013). *Rêzimana Kurdî, Kurmancî-Soranî*. Stenbol: Nûbihar.

Lezgin, R. (2013). Ji bo *Kurmancan bi Awayê Muqayeseyî Gramera Kirdkî* (Zazakî). Diyarbekir: Roşna.

Muhemmed, H. (2016). *Peyvsazî di Zimanê Kurdî de*. https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/peyvsazi-kiteb1.pdf

Muhemmed, H. (2016, Gulan 1). *Pirhejmariya Ducarî*. Zimannas. https://zimannas.wordpress.com/?s=pirhejmari

Ocek, N. (2014). *Rêzimana Kurmancî*. Wan: Sîtav.

Rêbera Rastnivîsînê, *Komxebata Kurmancîyê* (2019). Stenbol: Weqfa Mezopotamyayê.

Sadînî, M. X. (2020). *Feqiyê Teyran, Jiyan Berhem û Helbestên Wî*. Stenbol: Nûbihar.

Tan, S. (2015). *Rêzimana Kurmancî*. Stenbol: Enstituya Kurdî ya Stenbolê.

Thackston, W. M. (2006). *Kurmanji Kurdish: A Reference Grammar with Selected Readings*. Renas Media.

Toklu, O. (2021). *Dilbilime Giriş*. Ankara: Akçağ.

Trask, R. (2007). *Key Concepts in Language and Linguistic*. Oxon: Routledge.

Xanî, E. (2009). *Mem û Zîn*. Stenbol: Nûbihar.

Yıldırım, K. (2012). *Temel Aliştirma ve Metinlerle Kurtçe Dilbilgisi* (Kurmancî Lehçesi). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayinlari.

**Adres**
*RumeliDE Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*
Osmanağa Mahallesi, Mürver Çiçeği Sokak, No:14/8
Kadıköy - İSTANBUL / TÜRKİYE 34714
**e-posta:** editor@rumelide.com
**tel:** +90 505 7958124, +90 216 773 0 616

**Address**
*RumeliDE Journal of Language and Literature Studies*
Osmanağa Mahallesi, Mürver Çiçeği Sokak, No:14/8
Kadıköy - ISTANBUL / TURKEY 34714
**e-mail:** editor@rumelide.com,
**phone:** +90 505 7958124, +90 216 773 0 616

Yıldız, A., & Taşkın, H. (2018). *Şakiro Kewê Ribat*. Stenbol: Nûbhar.

Pêvek: Tabloya Morfemên Pirjimar ên Kurmancî

| Gire | Navê gireyê | Nimûne |
|---|---|---|
| Ø | Rewşa xwerû ya bê gire | Dar, kevir, mal, stêrk... |
| -n | Cînava kesandinê ya pirjimar, dema reha lêkerê bi dengdêrê biqede. | Em çûn.<br>Hûn çûn.<br>Ew çûn. |
| -in | 1) Cînava kesandinê ya pirjimar , dema reha lêkerê bi dengdarê biqede.<br>2) Cînava kesandinê ya pirjimar, di risteyên navdêrî de dema navdêr/rengdêr bi dengdarê biqede. | 1) Em hatin. Hûn hatin. Ew hatin.<br>2) Em xwendekar in. Hûn xwendekar in. Ew xwendekar in. |
| -ne | 1) Cînava kesandinê ya pirjimar, dema reha lêkerê bi dengdêrê biqede.<br>2) Cînava kesandinê ya pirjimar, di risteyên navdêrî de dema navdêr/rengdêr bi dengdarê biqede. | 1) Em xeyîdîne. Hûn xeyîdîne. Ew xeyîdîne.<br>2) Em mamoste ne. Hûn mamoste ne. Ew mamoste ne. |
| -ên | Gireya pirjimar ya diyar ya raveberê/veqetandek/îzafe | Darên gûzê |
| -êd | Gireya pirjimar ya diyar ya raveberê/veqetandek/îzafe | Mirovêd me |
| -ine | Gireya pirjimar ya nediyar ya raveberê/veqetandek/îzafe | Maline gund |
| -anên | Gireya pirjimar ya diyar ya raveberê/veqetandek/îzafe | Xalanên min |
| -gelan | Gireya pirjimar ya diyar ya raveberê/veqetandek/îzafe | Xezûrgelanên min |
| -an | Gireya tewangê ya diyar ya pirjimar | Zarokan cam şikand. |
| -inan | Gireya tewangê ya nediyar ya pirjimar | Carinan ew diçe bajêr. |
| -no | Gireya baneşanê dema banglêkirî bi dengdêrê biqede. | Gundîno werine alîkariyê! |
| -ino | Gireya baneşanê dema banglêkirî bi dengdêrê biqede. | Rojbaş hevalino! |
| di | Morfema azad ya pirjimarkirinê | Mirovê di me hatin. |